Hebanka Qul

Henîf Yûsif

Li ser bextê xwe yê reş
Li ser textê xwe,
textê zêrîn, textê darîn
Textê amadekirinê bo çûna bêveger
Dê bigirî, wek keçek qeyr e
li ber deriyê pîrbûna xwe
Û hêstir li çavan zuha bûne
Li benda mirazê bêçar e û asê.
Dê bigrî, yan binale,
Wek nexweşekê li ber candanê,
Ku ji heft ruhan yek tê nemaye,
Wek birîndarek birînek reş
Ku bi derdê xwe de ketiye,
Hêvî birriye ji zivirandina li xwediyan.
Dê bigirî wek çiyakekê top lê ketî
Wek erdek kelijtî,
Wek milletek derd pêketî
Dê bigirî û ji hêrisa xwe, were xwar
Wek xwedayekê, ku dihê xezebê
Dê bigirî heta ku ji te dihê
Guliyan li bayî bike
Desmalê nexîne berîka xwe
Hêstirên xwe bernede erdê,
Da ku kes di gola rondikên te de
Ji xwe re li masiyan negere.
Ezê dîsa bihêmê, bigrî lê ji kerrkî ve,
Bila kes li te, şah nebe û şar û şîretan li te neke
Ez di bextê te de me
Mer û metê,
Da ku tol û teresên demî,
Bi dîtina bejna nazik perik nedin
Û hêviyên min carek din nedizin
Ew jî gunnehkariyek mezin e,
Gava mirdar li te dicivin,
Hilpekin di dora te re,
Û xapandina mirazê min bikin.
Dê binalîne wek dêwek navsal
Wek çeqelek birsî
Wek marek dûvqut û bêgunneh
Wek kurdek bêçar û bêmiraz
Bêqedr û qîmet û belengaz
Wek kurdek bêzar, dil bi kul û xêrxwaz
Dê bigirî li ser textê zêrînê
Bi çar pêpikan
Dê bigirê ji ber kîna xwe
Ji ber jîna xwe
Dê bigirî azadiya min bigirî
Bi kurtî bigirî, bi kurdî bigirî
Bi heyvê re, bi daran re
Bi kevr û kuçkên çol û beyaran re
Bi Edûla Paşayê Milan re
Bi Xezala rûsor ji maç û şerm û xeydan
Bi Eyşana ku bi fîstanê sorê melesî
Diçe û dihê di nava gundan re.
Dê here bi rêk û derban de
Çoyê xwe bi dest xwe bike û
'Ew bike pezê xwe
Stirana xwe tew bike
Hêj dirêj e şeva me,
Dê here di demî de, wek zêrekê,
Veşartî di bin erdekê de
Ku kes bi ser hilnebe
Ji navan û qederê
Qedera Mîrê Misrê û sebra reş û zêrrê zer e
Hebanka qul bi lingê te ve ye
Digere li nav malan,
Parsa evîna reben dike
Pirsa evîndarên kujtî û mirdarên hiştî
Ger tu av bayî,
Ez da bibêjim: ji avan tu hêlî yî
Ger tu xem bayî
Ez da bibêjim: ji xeman tu bêlî yî
Nazdariya jî dihêle ji heyva ku xwe di pişt ewran re vedişêre
Ji tirsa qêrînan, heyva ku paçan diêxe guhên xwe
Da ku nebihîse û ji textê xwe nehê xwar.
Lê, ne xeme gava ku tu dûr herî
Ez dê bang bikim: dê were
Wek zîvê heyvekê li rûyê asmanî
Kofî û xencera xwe amade bike
Dê were, bi bejn û bala xwe ya kurmancî
Bistire hevîrê xwe
Sêla xwe li kuçkî bike
Di talda zinaran de
Di sîka dîwaran de
Li ser agirê demî
Bese, yêdî zikê xelkê dirriya
Ji nanê cehî û bizilmeyên garisî.